Kurmandji

Ji dê û bavên zarokên klasên 1. - 7.

SOMMERLES – ji ber ku xwendin di havînê de xwesh û giring e.

Sommerles.no chiye?

- Sommerles.no kampanyaya xwendinê a kitêbkxaneyên giştî ye ji boyî zarokên ku diçine klasên 1. - 7. li seranserê Norwêc.
- Sommerles.no belaş e, û mirov pir zewqê ji tevlîbûna wê dibînê.
- Sommerles.no wê 1. hezîranê destpêbike û wê roja 31. tebaxê bi dawî were.
- Sommerles. no ji boyî her kesî ye, ew ji boyî hem xwendevanên pir zîrek e, û hem xwendevanên nîvçe zîrek û yan jî ji boyî wan kesa ye ku mehtêciya wan bi alîkariyê heye di xwendinê de.
- Zarok pirtûkan dixwînin, pirtûkan di Sommerles.no de tomardikin û liser tiştên ku dixwînin xalan (puanan) werdigrin. Ew her wusa dikarin çîrokên ku bi tayebetî ji Sommerles re hatine nivîsandin bixwînin - ew jî tenê di Sommerles.no de dikarin bêne xwendin! Liser malper Sommerles.no zarok dikarin erkan çareser bikin û bibînin ka hevalên wan çi dixwînin.
- Zarok dikarin xelatên ciwan li kitêbxanê wergirin eger ew têr bixwînin.
- Zarok dikarin bi zimanê dayikê yan bi norwêcî bixwînin. Zarok wê xalan bistînin eger hun ên mezin ji zarokan re bixwînin (û xwendina bi hev re pir hêja ye).
- Mirov her wusa xalan werdigre eger mirov guhdariyê li pirtûkên dengdêr bike.

Wê zaroka min chawa bikaribe beşdar bibe?

- Ji boyî beşdarbûnê, divê hun bi hev re profîlekî ji zarokê re çêbikin.
- https://sommerles.no. Kitêbxane dikare alîkariya we bike eger mehtêcî hebe!
- Divê zarok bi e-maila dê yan bavê xwe tomar bike da ku bikaribe beşdar bibe.

Çima giring e mirov di Sommerles de beşdar bibe?

- Fêrbûna xwendinê a baş kilît e ji boyî wergirtina encamên baş di dersên din de li dibistanê.
- Lêkolîn didin xuyakirin ku zarokên ku di dema havînê de naxwînin, ji zarokên ku xwendine pîstir dixwînin dema dibistan ji nû ve destpêdike.
- Bi xêra Sommerles xwendin êdî pir xweş e!

Di sala 2019 da bêhtir ji 130 000 zarokên xwendinhez di Sommerles.no de beşdar bûn - ji ber vê em hêvîdikin ku zaroka TE îsal beşdar bibe!